

Zarokxane û dibistan li şaredariya Hässleholmê

Li jêr berpirsiyariya Saziya Zaro- û Perwerdeyê (Barn- och Utbildningsförvaltningen); ev sazî hene: zarokxane, sexbêriya pedagojîkî, malên demên vala (fritidshem), dibistana destpêkî, xwendegeha lîseyê, disbistana perwerdeya taybetî (särskola) û xwendegeha çandê (kulturskolan).

Heger ku tu ji xwe re li karekî digêrî, yan jî divê ji ber sexbêriya zarokê biçûktir li malê bî, te dîsan li zarokxanê mafê bicihkirina zarokan heye. Ji bo bicihkirina zarokê xwe li zarokxanê, yan li malên demên vala, tu pişkek pere didî. Zarokên li navbera salên sê û şeş ên li zarokxanê û li malên demên vala, wan maf heye ku ew li heftê panzdeh saet bêpere li zarokxanê bin.

Li Hässleholmê bîstûpênc dibistanên destpêkî, yê bi malên demên vala hene. Her wisa jî, li dor pêncî zarokxane û xwendegehên lîseyê hene. Dibistanên perwerdeya taybetî, li çend dibistanên destpêkî hene. Her wisa jî, ji bo xwendekarên lîseyê, ku ji hêla pêşketina xwe seqet (anormal) in, ji bo wan xwendegehên lîseyê yê bi perwerdeya taybetî hene. Li Swêdê, hemû zarok divêt herin dibistanê û dibistan bêpere ye. Berpirsiyariya weliyê zarokan e, ku zarokê xwe bişîne dibistanê.

Sala ku zarokê te bû şeşsalî, zarok li dibistaneka li nêzîkî ciyê ku hûn lê dirûnin têt bicihkirin. Sala yekê, zarok diçe sinifa pêşdibistanê (förskoleklass). Sala yekê ya li sinifa pêşdibistanê, ne mecbûrî ye, lêbelê piraniya zarokên li Swêdê diçin vê xebata amadekariya dibistanî, ya li sinifa pêşdibistanê. Ji sala ku zarok dibe heft salî, hingê perwerdeya mecbûrî ya neh salan, a dibistana destpêkî dest pê dike.

Piştî dawîhatina dibistana destpêkî, derfet heye, ku zarok ji xwe re dibistaneka lîseyê hilbijêre, yan jî heger zarok ji ser 19 salan be, hingê dikare perwerdeyeka din ji xwe re hilbijêre. Li Hässleholmê ji bo wan xortên ku gava hatine Swêdê û

temenê wan li navbera 16 ta 20 salan be, hingê ji wan re perwerdeya li Navenda Xortan heye. Navenda Xortan xwendegeheka lîseyê ya amadekar e, ku giraniya perwerdeya wê li ser fêrkirina zimanê swêdî ye. Xwendekar dikare li Navenda Xortan, ji bilî swêdî, perwerdeyeka din ji xwe hilbijêre, daku li bernameya millî ya xwendegeha lîseyê xortan bibe kompetent. Ji bo bidestxistina mafê xwandina li xwendegeha lîseyê xortan, pêwîst e, notên wî yên qarneyê, herî kêmtir heşt be. Bi vê re jî, xwandina zimanê swêdî, wek zimanê duwem mecbûriyetek e. Ji bo bidestxistina qarneyê çî pêwîst e, li vir dikarî bixwînî: <http://www.skolverket.se/laroplaner-amnen-och-kurser/grundskoleutbildning/grundskola/svenska-som-andrasprak>

Li ser dûrûnêzîkbûna dibistanê, neqliyeta bêpere bo dibistanê têt pêşkêşkirin. Tu wek weliyekî zarokê xwe dikarî dibistaneka din ji bo zarokê xwe hilbijêrî, lêbelê hingê divê tu mafê riya çûnûhata zarokê xwe bidî.

Li zarokxanê û dibistanê, xwarinên bêpere ji bo şagird û zarokan têt dayin. Van danên xwarinan, li gor pêwîstiya tibbî yan olî ya zarokan têt amadekirin.

Li dibistana destpêkî û li lîseyê, hemşîre û doktor û psîkolog û şêwirmendên dibistanê hene.

Destûra nîzamî û miameleya yeksan

Ji bo xwebaşhîskirin û pêşketina her kesekî li zarokxanê/dibistanê, her dibistanek ji bo personel û şagirdên xwe, qaîde û bernameyên yeksan hene.

Li dibistanê, cudakariya li ser kesekî, ji ber zayend, ji ber têtîlbûna grûpa civakî, ji ber xwedîbûna meyla cinsî, ji ber ol yan baweriyêke din, ji ber astengbûna kêmendamiyê, temen, nasnameya cinsî ya xeyrî adetî, yan jî ji ber hizr û derbirîna cuda, li gor qanûnê qedexe ye.

Her wisa jî, livên wek hev kêmkirin û rûmetşikandin jî qedexe ye. Li zarokxanê/dibistanê, divê şiddeta devkî yan fîzîkî tunebe. Em pîrsgirêkan bi peyivtin û axiftina bi hevdu re çareser dikin. Li hemû rewş û mercan, kesên şêwirmend û navsere û gihaştî, amade ne.

Hevkariya li navbera mal û zarokxane yan dibistanê

Wek weliyê zarokan, tu her dem dikarî serdana zarokxanê, malên dema vala û dibistanê bikî. Hevkariya li navbera te û zarokxanê/dibistanê, ji bo ewletî û pêşketina zarokê te grîng e. Li dibistanê wê şîfreyê programa komputerê, ya bi navê 'Schoolsoft' bidine te, ku tu ji wir agehiyên derbarê rewşa fêrbûna zarokê xwe, yan jî, agehiyên giştî yê derbarê rewşa dibistanê werbigirî.

Zarokxane/dibistan, xwedî erka çavdêriyê ye, loma rojên ku Heger zarokê te nahê zarokxanê/dibistanê, divê tu vê aghiye, ji serê sibehê ve bigehînî zarokxanê/dibistanê. Heger dibistan nikaribe di gel te pêwendî bike, hingê dibistan pêwendî di gel polîs, yan bi rêveberiya civakî (socialförvaltningen) re dike, heger gava neamadebûna zarokan ji dibistanê re ne hêne diyarkirin. Ev ji bo ewletiya zarokê te gerek e û loma pir grîng e, ku li zarokxanê/dibistanê agehiyên we yê pêwendiyê, yê rojane hebin.

Li zarokxanê/dibistanê, li ser pêşketina zarokê te, ji bo xwegihandina zarokan armanc û pîvanên zanyariyan, ku xebata zarokxanê/dibistanê li ser çêdibin, loma wê ji bo axiftina pêşketinê (utvecklingsamtal) bişînin pey te.

Wek weliyê zarokê xwe, tu her dem dikarî bîr û dîtînen xwe pêşkêş bikî. Bi riya organa hevkariyê ya dibistanê, bi riya encumena dêbavan/komela dêbavan/encumena herêmî, tu dikarî di gel dêbavên din beşadarê domana biryardanê bibî û bandora xwe li ser bikî.

Heger te divê tu derbarê dibistan û zarokxaneyan bibî xwedî aghiye bêtir, serdana vir bike: www.hassleholm.se

Agehiyên bêtir, derbareyê zarokxane û dibistanên li Swêdê, li namîlkeyên Skolverket'ê yê bi navê *Zarokxane Ji Bo Zarokê Te Ye* û *Dibistan Ji Bo Zarokê Te Ye* û her wisa jî *Malên dema Vala Ji Bo Zarokê Te Ye*. Van namîkeyan li dema axiftina nivîsîna zarokê te li ser dibistanê/zarokxanê, didine te.

Perwerdeya zimanê zikmakî

Heger zarokek xwedî dêbavek be, ku zimanê zikmakî yê ew dêbavî, ne swêdî lê zimanekî din be, ji bo vî zarokî, derfeta xwandina bi zimanê zikmakî têt

pêşkêşkirin, heger ku

- 1- ev zimanê danûstandina zarokî, yê li nav malê be, û
- 2- zanyariyên zarok, ên li warê zimanê zikmakî, pir fireh bin.

Serkarê xwendegehê, biryara li vê buwarê dide. Şert ew e ku gerek e bi kêmanî pênc şagird li nav wê şaredariyê hebin, ku dixwazin heman zimanê zikmanî bixwînin û her wisa jî, divê ji bo vê mebestê, mamosteyên minasib peyda bibin.

Ji bo wan şagirdên ku xwedî zimanê ji koma kêmatiya (aqaliyeta) millî ne, heger zimanê danûstandina zarok yê li nav malê, ne bi vî zimanî be jî, dîsan ji bo wan derfeta xwandina bi zimanê zikmakî têt dayin. Ji bo van zimanên kêmatî, hejimara zarokan kêm be jî, dîsan derfeta xwandinê ji bo wan têt terxankirin.

Swêdî wek zimanê duwem

Swêdî wek zimanê duwem, heger serkarê dibistanê biryar dabe, mijara swêdî dikeve şûna van:

- 1- *şagirdên ku zimanê wî yê zikmakî ne swêdî ye,*
2. *şagirdên ku zimanê wan ê zikmakî swêdî ye, lê ji dibistanên derveyî welêt hatine, û*
3. *Şagirdên penaber ku zimanê wan ê nav malê bi yekcarî swêdî ye û xwedî yek weliyekî swêdîaxêf in.*

Mafê ji bo xwandina swêdî, wek zimanê duwem her heye, bêyî pileya zimanî ya şagirdî. Ji ber ku hemû şagird, li gor şert û mercên xwe yê taybet, xwedî mafê perwerdeyê ne. Nota qarneya swêdî, wek zimanê duwem, her wek nota swêdî bi xwe ye û ev mijar li dirêjahiya hemû dema perwerdeyê, dikare were xwandin.

Li zimanê zikmakî rênîşandêrê xwandinê

Rênîşandêrê xwandinê, tedbîreka piştgiriye ye, ku heger gava şagird pêwîstî pê hebe, dibistan vê derfetê amade dike. Rênîşandêrê xwandinê, li gor pêwîstiyê cuda-cuda têt rêxistin.